

Nama Gabrêl Garsya Markîz

Wergêr:Awazê Kalo

Gabrêl Garsya Markîz romanivîsê Emrîka ya latînî yê herî navdar e. Ji ber nexweşiya xwe ji ronahiyê û qerebalixa jiyânê vekîşand nav siyan û nivînan. Û ev hevokên zêrîn wek nameya dawî ji heval û dostên xwe re nivîsand û bi rê kir. Ji ber girîngiya wê, me ji xwendevanên kurd re wergerand.

- Heger Xwedê ji bîrbike ku ez lîstikekim û jiyaneke din bide min, ezê tiştê li arê nedim. Dibe ku hemo tiştê ez pê diponijim ez nebêjim, lê misogere her tiştê ku dixwezim bêjim ezê pê baponijim.
- Ezê bihayê her tiştê li gor mebest û nîrxê wî yê rasteqîn pêdim
- Ezê hindik xewkim û pir xewnan bibînim, ji ber ku her me çavên xwe danhev şêst çirtikan(saniye) ji roniyê em wendadikin.
- fêrbûm Gava xelk radiweste ezê bimeşim gava xelk dikeve razanê ezê şiyarbim
- Ger Xwedêyê min bixweze jiyaneke din bide min ezê ciline sivik li xwe kim û li ser xakê xwe dirêjkim, ne tenê gewde taz, lê belê giyan tazî jî !!
- Ezê ji xelkê re vuyabikim, ku pirî û evînî ne li dij hev in û mirov kal dibe gava ji evînê bi dûr dikeve.
- Ezê basikan bidim zarokan, lê ezê wan bihêlim ku bi xwe fêrî firê bibin .
- Ezê yên navsal fêr bikim, ku mirin bi jîbîrbûnê re tê; ne bi kalbûnê re.
- Ez gelek fêrbûm ji we ey mirovino? Ez fêrbûm ku herkes dixweze li serê çiya bijî, bê ku zanibe ku raza şahiyê di hilkişandinê de ye.
- Ez fêrbûm ku zarokê nubûyî cara yekem ku tiliya bavê diguşiye ta dawiyê pê digre.
- Mafê mirov heye ji jor ve li yekî din binêre, tenê gava pêdivya alîkariyê pê hebe, ku yê din rabe ser xwe.
- Herdem tiştê ku tu pê hestdibî bêje û tiştê tu pê diramî bike.
- Ger min zanîba ku ev cara dawiyê, ku te tê

de dibînim, minê bi hêz tu hembêzkira û ezê li ber Xewdê bigeryama ku min bike parêzvanê giyanê te .

- Ger min zanîba ku ev xulekên(deqeyên) dawîne ku te tê de dibînim, minê bigota: Ez ji te hez dikim, û minê xwe bikira ku ez nizanîm tu vê yekê baş dizanî.
- Siba heroj heye û jiyaneke keyse dide ku em her tiştê baştirîn bikin, lê ger ez şaşbim û ev roja min a dawî be dixwezim ji te re bêjim çendî ji te hez dikim û bi carekê te ji bîrnakim.
- Ji ber ku, siba ji kesî re ne misoger e, ne ji ciwan û kalan re, loma dereng memîne, dibe ku carek din tu yê jê hez dikî nebîne û siba belkî neyê, tu yê poşman bibî, gava keysek tune be ji bo kenekî maçekê hembêzkirinekê an hêviyekê ji dilyarên xwe re bişîne.
- Hezker û dostên xwe bizavkin ji xwe dûr mexînin, di diguhên wan de bêje, ku tu hewcedarî wane guh bide wan û ji wan hez bike, herdem hevokên wek ez te fêmdikim min bibore ji kerema xwe spasî bila li ser zimanê te bin.
- Kes te bi bîra xwe nîne, ji ber ramanên veşartî di serê te de ji Xewdê hêz û hişmendiyê bixweze ku tu wan eşkere û ronî bikî.

Dumahîk: 15ê Gulanê

- Li qenalên tilfizyonên kurdî temaşe bikin. Guhdarî stran û mûzîka kurdî bikin.
- Em bawer in, ku mirovên me yên bi qîret, kanin bi van çend tiştên biçûk û pir giring rabin, û kanin tiştên ji wan mezintir û giringtir jî ji bona zimanê xwe bikin.
- Belê.. Parastina zimanê me erk, dilsozî û stubariyeke netewî ye. Pir giring û gerek e, ku em li zimanê xwe û cejna wê xwedî derkevin, da wê cejnê di jiyana gelê me de, bikin boneyeke jîndar
- Cejna zimanê kurdî li her mirovekî Kurd pîroz be.

Komîta rêvebir Ya S.F.P.Z.Ks